




BUROYA KURDÎ *ya Pêwendî û Agahdariyê*

Bultena agahdariyê N° 58 - Sibat 2010
Quai aux Pierres de Taille (Arduinkaai) 11, 1000 Bruxelles - Tél. 02 219 80 60
www.kurdishbureau.be kurdishbureau@scarlet.be

XEBATA BUROYA KURDÎ

ÇILE 2010

KONFÊRANS



31.01.2010 : Rewşa nuha ya Qereçyan li Ewropa

François Sant'Angelo, huqûqzan li Navenda ji bo Wekheviya Bextan û Têkoşina li dijî Nijadparêziyê, kurteya rewşa Qereçyan (Rom) li Beljîka û Ewropa got. Weka nîmîndeyê Beljîka li ECRI "European Commission against Racism and Intolerance" (Komîsyona Ewropî li dijî Nijadparêzî û Netehemmulkirinê) ya Konseya Ewropa, ew di van salên dawîn de beşdar bû şandeyên ku ji bo vê babetê

çûn seredana Rûmanya, Sirbistan, Slovakiya û Makêdonya.

Jimara "Rom" li Beljîka digihêje nêzîkî 26.000 û li Ewropa (Rojava û Rojhilat) 10-12 milyonan. Lê ev jimar ji rastiye kêmtir in, ji bo ku gelek ji wan zanava (nasname) xwe vedîşêrin. Rom gelekî ewropî ku ji berê nêzîkî 2.000 salan ji Hindistanê hatiye ye. Taybetiya wî ew ku ew bi awakî kûr girêdayî zimanê xwe, li gel hebûna zaravên cihê, û pêwendiyên malbatî yan êlî (eşîrî).

Di vajayê (eks) dîtina ku li ser wan hatiye belav kirin, piraniya wan ne koçer in, lê gawastî (di ciyê xwe de dimînin) ne. Lê ew neçar dibin ku her gav ciyê xwe biguherînin, ji sedema nêrîna ne baş li ser wan, hem ji aliyê desthilatan û hem jî ji aliyê xelk, nemaze li welatên kommunist ên berê ku tê de baweriyên çewt li ser wan gelek xurt in û digihêjin êrîşên canî (fîzîkî). Li gel ku li welatên ku tê de dijîn kartên wan ên zanavê (kimlik, hewiyê) hene, li Ewropa Rojhilatê mafên wan ên bingeî yê welatvanan, weka stendina karta kar, te'mîna saxiyê, dibistanên normal ji bo zarokên wan, nîn in. Gelek ji wan reviyane welatên Yekîtiya Ewropî, lê pirîcar mafê penaberiyê (iltica) ji wan re nayê dayîn.

NÛÇE JI KURDISTANÊ

ÇILE 2010

KURDISTANA TIRKIYÊ

DU PARLEMENTERÊN BERÊ YÊN KURD TÊN TAWANBAR KIRIN

Di 04 Çile 2010 de, piştî girtina partiya ku bi awakî ne fermî kurdî ye, DTPê, û guherandina wê bi «BDP»ê, du parlementerên berê yên DTPê, Ahmet Türk û Banû Aysel Tuğluk, ji aliyê dadgeha destûrî bi 56 û 52 sal cezayê zîndanê hatin tawanbar kirin !

Piştî derxistina wan ji parlamenta Tirkiyê, xuya bû ku di dema karê wan de 23 dosya li dijî Ahmet Türk û 22 li dijî Aysel Tuğluk hati bûn amade kirin !

(netkurd.com, 05.01.2010)

UN Û ZAROKÊN KURD

Encumena Mafên Zarok a UNê (Rêxistina Neteweyên Yekbûyî) hişdariyek (ixtar) da Tirkiyê li ser rewşa zarokên kurd ên nêzîkî 15 salî, ku ji bo beşdarbûna xwepêşandanan hatine zîndan kirin.

Piştî vekolînekê (ankêt), vê encumenê rappora xwe ya 29 Cotmeh 2009 weşand û tê de daxuyand (îlan kir) ku agahdariyên ku ji Tirkiyê li ser vê babetê stendine ne bawerbar in. Rappor ji Tirkiyê dixwaze ku fêreke mafên mirov bixe bernamêyên dibistanî û nemaze xwendekar û mamosteyan di warê aştiyê de bigihîne.

(rudaw.net, 07.01.2010)

BOMBEKIRINA KURDISTANA IRAQÊ

Di 07 Çile 2010 de, topxana tirkî gundên navçeyên sînorî yên Nihêl, Nêrwe Rêkan û Doskî, yên qezayê Amedî, li Kurdistanê Iraqê, bombe kirin.

(peyamner.com, pukmedia.com, netkurd.com, 08.01.2010)

FÊRÊN KURDÎ

Li ser daxwaziya mamosteyên kurd ku tirk û li gundên Diyarbekirê mamostetiyê dikin û kurdî nizanin, beşa Diyarbekirê ya rêxistina Eğitim Sen fêreke zimanî kurdî vekir. Nêzîkî 30 mamoste wê distînin.

(rudaw.net, 10.01.2010)

LÊDÛKETINA KURDAN

Ragirtinên girseyî

Di 10 û 11 Çile 2010 de, nêzîkî 124 Kurd, ku ji wan 13 zarok, li 9 bajaran hatin ragirtin. Sedemên van

ragirtinan pirjêcar xwepêşandanên bêdestûr ji bo partiya qedexe DTPê, ji sedema girêdanên wê bi PKKê re, ne. *(rudaw.net, 12.01.2010)*

Ragirtina 10 endamên «BDP»ê

Di 20 Çile 2010 de, serokê şaxa Iğdırê ya partiya «BDP»ê (ku ciyê DTPê stendiye), Mehmet Nuri Güneş, û 10 endamên din ên vê partiyê, ji aliyê hêzên jandarmê, di tevgerê ku di katjêr (saet) 3 ya serê sibê de dest pê kir, hatin binçav kirin. Piştî, yaneya (ekîp) lêgerîn li avahiya şaredariyê kirin û hin belgeyan birin. Serê sibê, xelk li ber vê avahiya şaredariyê civiya.

(rizgari.org, avestakurd.net, peyamner.com, rudaw.net, azady.nl, 21.01.2010 ; netkurd.com, Milliyet, 25.01.2010)

Berpirsiyarekî BDPê tê tawanbar kirin

Di 25 Çile 2010 de, serokê şaxa Semsûrê ya partiya BDPê, Mehmet Varol, ji bo 6 mehan hat zîndan kirin, ji sedema daxuyaniyê çapemeniyê ku wî li Mersinê weşandi bû.

(netkurd.com, 26.01.2010)

ALÎKARIYA YEKÎTIYA EWROPÎ NAGIHÊJE KURDISTANÊ

Radyoya swêdî Ekot/P1 vekolînek (ankêt) li ser alîkariya Yekîtiya Ewropî ji Tirkiyê re weşand û got ku di maweya (muddet) 2004-2010 de, 75 milyar kronên swêdî ji vî welatî re hatine dayîn, lê ku navçeyên xizan (feqîr), weka Diyarbekir, Mardîn, Colemêrg ... jê bêpar (mehrûm) in.

Rojnama swêdî Svenska Dagbladet jî dîtina Levent Korkut, berpirsiyarê tirk ê alîkariya Yekîtiya Ewropî ji Tirkiyê re, û Evin Çetin, endama partiya sosyal-demokrat a swêdî, stend. Her du jî heman (eynî) tişt got. *(eurokurd.net, netkurd.com, avestakurd.net, rizgari.org, 12.01.2010)*

CARDIN PÊTROL LI KURDISTANÊ

Şirketa tirkî ya pêtrolê, TPAO, daxuyand ku pêtrol li nêzîkî Şirnexê, bi kûrayiya 3.250 m., hat dîtin û ku li vê navçê gelek pêtrol heye.

(avestakurd.net, 20.01.2010)

RÊKTORÊN KURDISTANA IRAQÊ DIÇIN SEREDANA ZANÎNGEHA MÊRDÎNÊ

Di 24 Çile 2010 de, sê rêktorên zanîngehên Kurdistanê Iraqê, Dr. Asmat Xalid, ji zanîngeha Duhokê; Alî Saed Muhammed, ji zanîngeha Suleymaniyê, û Muhammed Sadiq, ji zanîngeha Hewlêrê, çûn seredana rêktorê zanîngeha Arkutlu, li Mêrdînê, Prof. Dr. Bedil Omay.

Evê dawîn daxuyand ku ev seredan di çarçeva biryara vekirina enstituyên zimanên zindî li vê zanîngehê (li bultena me ya buhurî binêre) û wajokirina (imza) protokola alîkarî û hevkarîya akadêmîk û zanyarî (ilmî) bi welatên hevsî (cîran) re hat kirin.

(netkurd.com, 25.01.2010; rudaw.net, 29.01.2010)

KURDISTANA IRAQÊ

ŞANDEKE BRÎTANÎ LI KURDISTANÊ

Di 06 Çile 2010 de, serokê Kurdistanê Iraqê, Mesûd Berzanî, pêşwaziya Banû Margaret Man, parlementer, huqûqzan û seroka Koma Piştgiya Kurdistanê li parlamenta brîtanî, û şandeya ku pê re bû, ku ji Gary Kan, sekreterê vê Komê û danişmendê (muşawir, adviser) parlamentê, û Banû Beyan Samî Abdulrahman, nimînendeya Hukûmeta Herêma Kurdistanê Iraqê li Brîtanya pêk hati bû, kir.

Banû Man ji serok Berzanî re rasthatinên xwe bi serokê Parlemeta Kurdistanê û jimareke wezîran re gotin.
(pukmedia.com, 06 û 10.01.2010)

GOKE HEVRAYÎ YA 270 ZAROKAN

Di Çile 2010 de, di dema kolanên li Dubiz, li nêzîkî Kerkûkê, de goreke hevrayî ku tê de laşên 270 zarokên kurd ên ji 3 salî kêmtir hat dîtin.
(peyamner.com, 07.01.2010)

ÊRÎŞ LI NAVÇEYÊN KURDISTANÊ YÊN EREBKIRÎ

Kerkûk

Di 06 Çile 2010 de, bombeyek li ser erebeyeke “pick-up”, li ser riya sereke ya di navbera Kerkûk û Tirkîrê de, teqiya. Du kes birîndar bûn.
(pukmedia.com, 09.01.2010)

Xaneqîn

Di 07 Çile 2010 de, bombeyek li ber mizgefteke şî li Xaneqînê teqiya. Polîsek hat kuştin û 25 kes birîndar kirin. Mizgeft û 25 firoşgeh (dikka) gelek hatin têk dan (xerab kirin).
(pukmedia.com, avestakurd.net, 07.01.2010)

SEROKÊ LEŞKERÊ IRAQÎ (KURD) JI OBAMA XELATEK DISTÎNE

Di 10 Çile 2010 de, serokê leşkerê iraqî, gênêral Babekir Zîbarî (Kurd), ji serokê amerîkî Barak Obama Xelata Hêjabûnê stend.

Di merasîma dayîna xelatê de, serokê hêzên amerîkî li Iraqê, gênêral Raymond Odierno, got ku Zîbarî ev xelat

nemaze ji bo maweya Sibat 2007 – Sibat 2008 stend, ji bo ku wê gavê tundî (şiddet) kêmtir bû.

(pukmedia.com, rudaw.net, 10.01.2010)

WEZÎRÊ PERWERDÊ LI LONDONÊ

Ji 11 heta 14 Çile 2010, wezîrê perwerdê yê Kurdistanê Iraqê, Sefîn Dizeyî, û wezîrê hînkirina bilind û lêgerîna zanyarî, Dr Dilawer Ala'eldîn, li Londonê beşdar bûn konferanseke navneteweyî ya salane ya wezîrên perwerdê, ya bi navê “Moving Young Minds” (Mejiyên Cuhana Gerrok). Îsal, 750 pisporên perwerdê û 73 wezîr, ji 100 welatan, beşdar bûn vê konferansê.

Serokwezîrê brîtanî, Gordon Brown, konferans vekir. Piştî, wezîrê brîtanî yê perwerdê li ser girîngiya hevkarîya di navbera wezaretên perwerdê li cihanê de, ji bo pêşdebirina pêvajoya (proses) “Perwerde ji bo hemiyar”, peyivî.

([KRG, peyamner.com](http://KRG.peyamner.com), pukmedia.com, 15.01.2010)

MÊDYA LI KURDISTANÊ

Endamekî polîtburoya Yekîtiyê Niştîmanî Kurdistanê ji rojnama El-Zeman re got ku li Kurdistanê Iraqê 826 rojname û kovar, ku ji wan ên rojane, heftane û hin mehane, hene. Û wî got jî ku 50-60 radyo jî hene.

(avestakurd.net, 14.01.2010)

BIDARVEKIRINA ELÎ KÎMYAWÎ



Di 25 Çile 2010 de, Elî Hesên El-Mecîd, ku bi sernavê « Elî Kîmyawî » hatiye nasîn, bi bidarvekirinê hat îdam kirin. Ew pismamê Saddam Huseyn û berpirsiyarê

herêma Bakurê Iraqê bû. Ew bû ku êrîşa bi çekên kîmyawî li Halabca, ku tê de 5.000 kes fetisîn, pêk anî bû. 5 meh piştî ketina rejîma Saddam Huseyn, ew hati bû ragirtin.

(TV û malperên kurdî, 25.01.2010)

BARAK OBAMA PÊŞWAZIYA SEROKÊ KURDISTANÊ DIKE



Di 25 Çile 2010 de, serokê amerîkî Barak Obama li Saraya Sipî pêşwaziya Mesûd Berzanî, serokê Kurdistanê Iraqê, û şandeya ku pê re kir. Ev şande ji serokwezîrê berê yê Kurdistanê, Nêçîrvan Berzanî; nimînendeyê Hukûmeta Herêma Kurdistanê li Washingtonê, Qubad Talabanî; serokê Ajansa Parastina Herêma Kurdistanê, Mesrûr Berzanî; serokê kabîna Mesûd Berzanî, Fuad Huseyn; berpirsiyarê pêwendiyên derve yê Hukûmeta Kurdistanê, Fellah Mustafa, û wezîrê kaniyên sirûştî (tabîî), Aştî Hawramî, pê hati bû.

Her du alî li ser pirsên di navbera Bexdad û Herêma Kurdistanê de, hilibijartinên wêbê yên Iraqê, xurtkirina ewlehî (emniyyet) û aborê (êkonomî) ... peyivîn.

Di 25 Çile de jî, Mîrza Berzanî ji aliyê cîgirê serokê amerîkî, Joseph Biden, hat pêşwazî kirin.

Di 26 Çile 2010 de, ew ji aliyê wezîra amerîkî ya karên derve, Hilary Clinton, hat pêşwazî kirin. Piştî, li avahiya nimînendetiya Kurdistanê li Washingtonê rastî revenda (diaspora) kurdî li Amerîkî hat. Kurd ji Dewletên Virginia, Maryland, New York û Colorado hati bûn. Û rastî civata fille li Iraqê jî hat.



Di 27 Çile 2010 de, li Pentagonê ji aliyê wezîrê amerîkî yê parastinê, Robert Gates, hat pêşwazî kirin. Û ew rastî seroka « Chamber » (parlement), Nancy Pelosi, û sênatör John McCain, Joseph Lieberman, Lindsey Graham û John Kerry jî hat.

Di 27 Çile de jî, li « Brookings Institute », di semînereke bi navê « Wêbêya Iraqê û Hilibijartinên Nêzik », peyivî. Beşdar û rojnamevanan axaftina wî bi baldariyeke mezzin şopand û jê gelek pirs pirsîn. « Moderator » Kenneth Pollack, birêvebirê Navenda Lêgerînên Rojhilata Navîn, di vekirina semînerê de got ku « hemî rê ji aktorê girîngtirîn li Iraqê, Mesûd Berzanî, derbas dibin ».



Di 28 Çile de, çû seredana fermandariya leşkerî ya serbazên (esker) amerîkî yên xanenişîn (teqa'ud). Piştî, rastî wezîrê bazarganiyê, Garry Lock, hat.

(TV û malperên kurdî, 25-29.01.2010)

SEROKÊ KURDISTANÊ LI OTRÎŞÊ

Di 30 Çile 2010 de, serok Berzanî çû Otrîşê (Avusturya, Nêmsa) û tê de bi awakî cihê rastî şandeyeke partiya kurdî ya Tirkîyê „DTP“, ku nuh hatiye qedexa kirin, a

bi serokatiya serokê wê yê berê Ahmet Türk, û şandeke



partiya tirkî ya hukûmî, AKPê, ku tê de parlamenterekî kurd Dengir Firat, hebû, hat. Wî şîret li wan kir ku pîrsa kurdî bi aştiyane çare bikin û piştgiriya ramyariya (siyaset) serokê tirk Recep Tayyip Erdoğan, a bi navê „vebûna kurdî“, bikin.

Di 31 Çile 2010 de, serokê otrîşî, Hans Fischer, û serok Berzanî li Vienna beşdar bûn konsêreke kurdî ya muzîskvan û stranbêjê navdar Şivan û kemanciyê navdar Dilşad. Ev konsêr li bin „patronaj“a serokê otrîşî hat pêk anîn.

KURDISTANA ÎRANÊ

KURDEK TÊ ÎDAM KIRIN

Di 06 Çile 2010 de, Fesîh Yasemînî, ji gundê Hindiwana, li nêzikî Xoyê, li Kurdistanê Îranê, hat îdam kirin. Ew ji 2008 de li zîndanê bû û bi endambûna PJAK (baskê îranî yê PKKê) hati bû tawanbar kirin. Dadmendê (hakim) wî di 18 Çile 2010 de hat kuştin (li jêr binêre).

Li gora ajansa nûçeyan Firatê, 14 girtiyên din ên kurd ewê bîn îdam kirin û ji 2007 de, 3 endamên PJAKê hatine îdam kirin.

(avestakurd.net, rizgari.org, 07.01.2010; rudaw.net, 07.01.2010)

XWEPÊŞANDÎ TÊN RAGIRTIN

Di 15 Çile 2010 de, polîsê îranî komeke Kurdên ku dixwest ku li Sinê, li Kurdistanê Îranê, xwe pêş bidin (bimeşin) ragirt. Wan dixwest ku mirina çalakvan İbrahim Lutfullahî, ku di 15 Çile 2008 de li zîdana Sinê di mercên tarî de miri bû, bi bîr bînin.

(rudaw.com, 16.01.2010)

DADMENDEKÎ ÎRANÎ TÊ KUŞTIN

Di 18 Çile 2010 de, dadmendê îranî, ê ji riha (asl) azerî, Welî Hacî Qulîzade, li ber mala xwe ji aliyê du kesên bi „motor“ hat kuştin. Vî dadmendî fermana îdamkirina du Kurdan, Hikmet Demir û Fesîh Yasemînî, da bû.

(avestakurd.net, 18.01.2010)

Li gora ajansa nûçeyan Firatê, HRK „Hêzên Rojhilata Kurdistanê“, ku nêzikî PKKê ye, ev kuştin hilgirt ser xwe.

(aknews.com, avestakurd.net, 21.01.2010)

KURDEKÎ TEHRANÊ TÊ BIN ÇAV KIRIN

Di 26 Çile 2010 de, xwendekarekî kurd li zanîngeha Tehranê, Cihangîr Abdullahî, hat bin çav kirin. Li gora rappora Rêxistina Mafên Mirov li Kurdistanê, Abdullahî li beşa zanînen ramyarî (siyasî) dixwîne û berpirsiyarê Civaka Çandî ya Xwendekarên Kurd li Zanîngeha Tehranê ye. Rapport dibêje jî ku sedema vê ragirtinê ne zelal e. Di heftiyên derbasûyî de, bi dehan xwendekarên kurd li zanîngeha Tehranê hatin ragirtin û bin çav kirin.

(rudaw.com, 28.01.2010)

BOMBEKIRINA KURDISTANA IRAQÊ

Di 29 Çile 2010 de, topxana îranî cardin navçeyên sînorî yên Kurdistanê Iraqê, li Zarawa, 130 km li Bakurê Rojhilata Suleymaniyê, bombe kirin.

(aknews.com, 29.01.2010)

KURDISTANA SÛRIYÊ

5 KURD TÊN TAWANBAR KIRIN Û PARÊZEREK TÊ RAGIRTIN

Di 02 Çile 2010 de, Rêxistina Kurdî ya Mafên Mirov li Sûriyê, MAD, daxuyand ku di 29.12.2009 de, 5 Kurd ji aliyê dadgehê hatin tawanbar kirin : Xelîl Feydê Delî, Munzir Abdulfattah Reşo, Ciwan Muhammed Ahmed û Menan Ahmed Sîdo.

Her duyên pêşîn cezayê 4 sal zîndan û her sêyên din 6 sal stend. Hemî bi endambûna PYD « Partiya Yekîtiya Dêmkokrat » (baskê sûrî yê PKKê) hatine tawanbar kirin.

Heman (eynî) rêxistin daxuyand ku di 12.12.2009 de, parêzerê (avukat) kurd Mustafa Ismaîl ji aliyê hêzên ewlehiyê yê Helebê hat ragirtin û ku heta nuha çarenûsa (qeder) wî ne xuyaye.
(avestakurd.net, 02.01.2010)

SÊ XWENDEKAR TÊN RAGIHANDIN

Di 06 Çile 2010 de, Rêxistina Kurdî ya Mafên Mirov li Sûriyê, MAD, ragirtina 3 xwendekarên kurd daxuyand : Havraz Muhammed Emîn ji aliyê hêzên ewlehiyê hat ragirtin û kompyûtera wî hat birin. Du xwendekarên din, Mustafa Na'san û Dilbirîn Nosî, jî hatin ragirtin. Malbatên wan nizanin ne li ku ne, ne jî çima ew hatine ragirtin.
(azady.nl, 06.01.2010)

CARDIN DU SERBAZÊN KURD TÊN KUŞTIN

Di 06 Çile 2010 de, Rêxistina Kurdî ya Mafên Mirov li Sûriyê, MAD, daxuyand ku serbazekî (esker) din ê kurd

di dema xizmeta leşkerî de hat kuştin (ev serbazê 35mîn e ku ji dema serhilada kurdî ya 12 Adar 2004 de tê kuştin). Navê wî Izzeddîn Moro ye, ji gundê Derbazînê, navçeya Efrînê, ye. Ew zewicî û bavê zarokêkî bû.
(avestakurd.net, 06.01.2010)

Di 10 Çile 2010 de, Rêxistina Kurdî ya Mafên Mirov li Sûriyê, MAD, daxuyand ku di 01 Çile 2010 de, Kurdekî pîr, Abdulrezaq Cengo, dema ku dixwest ku biçê seredana kurrê xwe, Dr. Elaeddîn Cengo, li Mîriyên Erebi, ji aliyê hêzên ewlehiyê yê ezmanî hat ragirtin. Heta nuha çarenûsa wî ne naskirî ye û tê bawer kirin ku sedema vê yekê dîtînen wî yê li ser Kurdan e. Cengo ola misilman li Şamê xwendiyê û bi salan li Qamişlî û li Mîriyên Erebi mamoste bû. Ew bi welatparêziya xwe ya kurdî navdar e.
(avestakurd.net, peyamner.com, 07.01.2010)

NÛÇEYÊN ÇANDÎ YÊN KURDÎ

PROSPÊKTUSEKE BIJÎJKÎ BI KURDÎ

Şirketa dermanan Awamedica cara pêşîn prospêktuseke (rûpela ku dermanan wasf dike û tê xistin nav qutiyên van dermanan) bijîjkî (tibbî) bi zimanê kurdî weşand. Ev dermanê li dijî êşê, Par Azar, e. Birêvebirê vê şirketê, Bahram Rasûl, ji Kurdistan TV re daxuyand ku ewê ev derman li Kurdistana Iraqê û li tevayiya Iraqê bê firotin.
(peyamner.com, netkurd.com, avestakurd.net, rizgari.org, 04.01.2010)

PIRTÛKEK LI SER DEWLETA TIRKÎ Û KURDAN

Rojnamevan Belma Akçura pirtûkek bi navê « Fîlma Dewletê li ser Kurdan », piştî berhevkirina raporên partiyên ramyarî (siyasî), yê rêxistinên civakî, hukûmet û leşkerê tirkî, nivîsî. Ew ji aliyê weşanxana New Age hatiye weşandin. Akçura tê de balan dikîşîne 70 raporên ku di 86 salan de li ser vê pirsê hatine nivîsîn, lê ku hîn ne hatine weşandin.
(rudaw.net, 07.01.2010)

BIJÎJKEKÎ KURD BAWERNAMA "BORD" A AMERÎKÎ DISTÎNE

Bijîjkek (doctor) ji Kurdistana Iraqê, Dr Umar Şêx Ma'sûm Neqşbendî, bilindtirîn bawername (dîplom) di cihana emeliyata dev û diran de, "American bord of periodontology", stend.

Dr Neqşbendî ji 25 salan de li Amerîka dijî û bawername zanînen ramyarî (siyasî) ya zanîngeha Hustonê, li Texasê, û bawernameyên cihê di zanînen (ilm) goştê diranan û çikandina diranan de stendine. Ev

bawername dawîn a "Bord" bala çapemeniya amerîkî û ewropî kişand û hin rojname û kovar pê re hevpeyvîn kir.

Dr Neqşbendî, bi masrafa xwe, di yaneya (êkîp) bijîjkî (tibbî) ku li Kurdên ku bûne qurbanên tundiyên (şiddet) hukûmetên xwe dinêre de ye. Û wî alîkariya kesên ku di şerrê Kosovo de hatin qewirandin yan ku reviyên kirin. Ji 2002 de, Dr Neqşbendî diçe seredana Kurdistana Iraqê û tê de beşdar dibe saxkirina xelk û konfêransên ji bo bijîjk û xwendekarên beşa diranan tên dayîn. Û wî bi deh hezaran dolar alîkarî, ji bo kirîna destgehên emeliyatan û yê din, kir.
(peyamner.com, 05.01.2010)

"FACEBOOK" BI KURDÎ

Malpera navdar "Facebook" dest bi weşandina bi zimanê kurdî jî kir. Diviya ku berê dest bi kampanyakê bê kirin ji bo ku jimara beşdarên têr bike. Tê texmîn kirin ku jimara Kurdên ku wê bi kar tînin digihêje 3 milyonan : www.facebook.com/translations/index.php
(netkurd.com, pukmedia.com, 13.01.2010)

KEVNEŞOPÊN DUHOKÊ

Birêvebirê kevneşopên parêzgeha Duhokê, Hesên Ehmed Qadir, got ku di sê salên dawîn de, ji 1.500 kevneşopên dîrokî, ku hin ji wan digihêjin dema kevvir, li çend navçeyên vê parêzgehê hatin dîtin.
(aknews.com, avestakurd.net, 15.01.2010)

PIRTÛKEKE XWARINÊN KURDÎ

Kurdologa îtalî, Mirella Galletti, û Fuad Rahmanî di 2008 de pirtûkek li ser xwarinên kurdî bi zimanê îtalî,

bi navê “Çanda Çeştxanê li bal Kurdan” (çeştxane = metbax) nivîsî bû. Weşanxana kurdî Avesta ew nuh bi tirkî weşand, weka destpêka rêzereyeke vê celebê, bi navê “Serçavan/Midbex”, bi kurdî û bi tirkî.

Mirella Galletti doçenta dîroka welatên misilman li zanîngeha Napolî ye. Fuad Rahman Kurdekî Kerkûkê ye û ji zû de li Torîno dijî. Xwaringeheke (rêstoran) wî bi navê Kerkuk Cafe heye. Ew tê de xwarinên kurdî, erebî, îranî û tirkî pêşkêş dike.

Pirtûk ji sê beşan pêk hatiye : A 1mîn li ser adet û çanda xwarinê li bal Kurdan e û giha, heşînayî û xwarinên taxi (mehellî) li Kurdistanê wasf dike. Beşa 2mîn metnên wêjeyî (edebî) li ser xwarinên kurdî, ku ji aliyê nivîskarên kurd (ji Mem û Zînê heta Erebe Şemo) û gervanên ewropî hatine nivîsîn, pêşkêş dike. Beşa 3mîn

ji aliyê Fuad Rahamnî hatiye amade kirin. Ew tê de reçeteyan (wasfa) pêşkêş dike. (nefel.com, 15.01.2010)

JINEKE KURD JI ALIYÊ SEROKÊ ALMANYA TÊ PÊŞWAZÎ KIRIN

Bi hinceta sersalê, serokê Almanya Köhler 62 kesên ku bi pirsên perwerde, wekhevî, rewşa penaberan û entêgrasyonê xerîk (mijûl) dibin vexwendin (dawet kirin) saraya xwe.

Ji nav mêvanan, Rojîn Murad, 28 salî, jineke cuhan ji Kurdistanê Sûriyê. Ew li Liefrehosenê bi zîlamê xwe re dijî û civakzanî (sosyolojî) û perwerde li zanîngeha Kölnê dixwîne. Serokê alman ji bo alîkariya wê ya biyaniyan spasiya wê kir. (avestakurd.net, 29.01.2010)



Ev bulten, bi alîkariya Vlaamse Gemeenschapscommissie (VGC), bi kurdî, fransî, hollandî û ingilîzî hatiye weşandin.